

Di Kurdîya Kurmancî de Îzafeya Berfirhebûyî (Devokên Başûrê Rojhilatê û Başûrê Rojavayê)

Mehmet Yonat*

Destpêk

Îzafe termek e ku di zimanzanîya Îranî de ji bo avanîya ravekê tê bikaranîn. Parîkela îzafeyê ku ji bo girêdana hêmanên raveker bo raveber (navdêra eslî ya avanîya îzafeyê) tê bikaranîn. Ev partîkel di kurdîya kurmancî de li hember zayend û hejmarê hessas e. Ji bilî fonksîyona girêdanê ev partîkel di fonksîyona anaforîk de jî tê bikaranîn. Ev her du fonksîyon ew fonksîyon in ku heta niha tê zanîn. Haig behsa fonksîyoneke din ya partîkela îzafeyê dike ku di vê gotarê de mijara eslî ew e. Ev fonksîyona partîkela îzafeyê, bikaranîna îzafeyê ji çarçova morfolojîk ber bi çarçoveyeke sentaktîk berfireh dike. Di vê fonksîyonê de partîkela îzafeyê di hevokên navdêrî û yên lêkerî de îşaretê kirdeyê (hin caran bireserê) dike. Di hevokên lêkerî de bi piranî mena berdewamîyê û mena perfektîyê dide. Ev fonksîyon di lîteratûrê de wek îzafeya berfirehbûyî (extended ezafe) hatiye leksîkalîzekirin.¹

Di vê xebatê de, hem îzafeya berfirehbûyî bi hurgilî hatiye terîfkirin hem jî di du devokên kurdîya kurmancî de ev avanî hatiye analîzkirin. Ji bo vê analîzê, divê di serî de behsa senifandina devokên Kurmancî were kirin, paşê jî behsa girseya axêverên ji bo vê analîzê hatî hilbijartin were kirin. Wek dawî jî divê di derbarê amûra pîvandîna ya îzafeya berfirehbûyî de agahî were dayîn. Devokên kurmancî heta niha ji hêla kêm nivîskaran ve bi awayeke zanistî hatine senifandin. Mesela, Zinar senifandineke devokên Kurmancî kiriye lê wî ev senifandina xwe bi delîlên zanistî ve nîşan nedaye. Ew devokên Kurmancî di bin deh devokan de senifandine; Devoka Afrînî,

* Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, mehmetyonat49@gmail.com, Orcid: 0000-0001-8576-7486

¹ Haig, G., "The Emergence of the Tense Ezafe in Bahdîni Kurdish.", *Second International Conference on Iranian Linguistic*, 2007; Haig, G., "Alignment Change in Iranian Languages. A Construction Grammar Approach", *Empirical Approaches to Language Typology*; 37, 2008; Haig, G., "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle", *İçinde Nominalization in Asian Languages: Diachronic and Typological Perspectives*, John Benjamins, c. 1, 1 c. (Amsterdam, 2011), 363-90.

Devoka Cizîrî, Devoka Sincarî, Devoka Behdînî, Devoka Hekarî, Devoka Şikakî, Devoka Bazîdî, Devoka Botanî, Devoka Şemdînanî, Devoka Rojavayî.² Lewra ev senifandin ji delîlên zanistî mehrûm in em ê vê wek bingeş negirin.

Xebata Haig û Öpengin ya bi nave “Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects” (Di Kurmancî de Varyasyona Heremî: Senifandineke Despêkî ya Devokan) di warê senifandina devokan de xebateke baş e. Di vê xebatê de devokên Kurmancî di bin pênc beşan de hatine senifandin; Devoka başûrê rojhilat, devoka başûr, devoka bakûr, devoka başûrê rojava, devoka bakûrê rojava. Devoka başûrê rojhilat: Wek devoka behdînî jî tê zanîn ku li heremên Hakkarî û Duhokê tê axaftin.

Devoka başûr: Li Mêrdîn, Êlih, Dîyarbekir, Şirnex, Riha û Hesekeyê tê axaftin.

Devoka bakûr: Wek devoka Serhedê jî tê zanîn. Mûş, Erzurum, Agirî, Bedlîs, Çewlig, Dîyarbekir û hin cihên Wanê tê axaftin.

Devoka başûrê rojava: Li Semsûr, Entep, qîsmeke Rihayê û Helebê tê axaftin.

Devoka bakûrê rojava: Mereş, Meletî, Sîwasê tê axaftin.³

Di vê xebatê de wê ev senifandin wek bingeş were girtin. Her çiqas di vê senifandinê de Şirnex di nav devoka başûr de cih bigire jî, Mintîqa ku xebata qadê lê hatî kirin di nav sînore devoka başûrê rojhilat de ye.

Ev xebat wexta tetbîqê qadê bû, hin pirsgirêk hatin meydanê. Lewra Kurmancî di nav gurehîneke gelek lez de (asîmîlasyon) ye û hemû cenerasyon wek hev naxivin. Di vê guherînê de duzimanî jî xwedî gelek bandoreke mezin e. Her wekî Öpengin gotî *mirov dikare dîyar bike ku cimaeta zimanî ya kurdîyê xwedanê qerekerê duzimanîya civakî ye, bi kurdî û bi Tirkî*.⁴ Bi taybetî wexta mijar mijareke hessas wek îzafeya berfirehbûyî be, wê demê gelek bikaranînên cuda di navbera cenerasyonan de derdikevin holê. Loma jî, wexta ev pirsên amûra pîvandî li axêveran hate pirsîn ji sê cenerasyonan pirs hatin pirsîn; yên ciwan, yên navsere û yên kal. Dîsa lewra ev mijara îzafeyê ji hêla zayendê ve hessas e û di Kurmancî de jî kesê ku refere lê tê kirin ji bo mijara zayendê girîng e, axêver ne tenê ji hêla emr ve lê ji hêla zayenda bîyolojîk ve jî wek jin û mêr hatin hilbijartin. Di encamê de li her

² Zinar, Z., *Di Çanda Kurdi de 37 Şaxên Zanistê* (Stockholm: Weşanên Pêncinarê, t.y.).

³ Haig, G. & Öpengin, E, “Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects.”, *The Journal of Kurdish Studies* 2, sy 2 (2014): 143-76.

⁴ Öpengin, E, *Rewşa Kurdî ya Sosyolinguîstîk li Tirkîyeyê* Stenbol: Avesta Yayınları, 2011, 37.

heremê ji şeş kesan ev pirs hatin pirsin; ciwan-mêr, ciwan-jin, navsere-mêr, navsere-jin, kal-mêr û kal-jin.⁵

Di vê gotarê de di serî de behsa avanîya îzafeyê ya di Kurmancî de hatiye kirin. Paşê li ser fonksiyonên partîkela îzafeyê hatiye sekinîn. Dûre, ji bo femkirina eslê îzafeya berfirehbûyî li ser paşxaneyê teorîk ya avanî û partîkela îzafeyê hatiye sekinîn. Pey ku ev îzahatên teorîk hatine kirin behsa îzafeya berfirehbûyî bi hurgilî hatiye kirin. Beriya ku behsa xebata qadê û desketinên di du devokên Kurmancî de were kirin, di derbarê amûra pîvandîna ya îzafeya berfirehbûyî de agahî hatine dayîn. Di dawîyê de du devokên Kurmancî ji aliyê îzafeya berfirehbûyî ve hatine analîzkirin. Di encamê de jî destketiyên xebata qadê hatine vegotin. Di vê xebatê de wexta mînak hatine analîzkirin hin kurte hatine bikaranîn. Ew kurte di dawîya vê xebatê de di nav tabloyekê de wek pêvek 2 hatiye dayîn.

Di Kurdîya Kurmancî de Avanîya Îzafeyê

Partîkela Îzafeyê ji bo têkilîya di navbera navdêreke dîyar an jî yeke nedîyar û hemû raveker û her cure pêbestên wê navdêrê teqîpkirî tê bikaranîn. Ev partîkel tê dawîya navdêra dîyar an jî ya nedîyar û bi wê re yekûnekê çê dîke. Li gor zayend û hejmara navdêrê ev partîkel diguhere.⁶ Yanê partîkela îzafeyê ji bo çêkirina ravekan tê bikaranîn. Di ravekan de navdêra eslî raveber e û partîkelên îzafeyê distîne. Wek,

Mal-a	Sînem-ê
Raveber (Navdêra Eslî) – partîkela Îzafeyê	Raveker-paşgira tewangê

Bi Navdêra eslî qest ew tişt e ku wexta ravek tê çêkirin, ji wê gruba bêjeyan bêjeya ku tê qestkirin e. Di mînaka me de wexta “mala Sînemê” tê gotin, tiştê qest kirin “Sînem” nîne lê “mal” e. Her wekî li jor jî hat behskirin partîkela îzafeyê li gor zayend û hejmara navdêra

⁵ Bê ku avanîya îzafeyê û îzafeya berfirehbûyî bi hurgilî were zanîn, behskirina navero-ka amura pîvandîna ya îzafeya berfirehbûyî dibe ku neyê fêmkirin. Loma jî di beşa pêncan de derbarê naveroka vê amûrê de agahî hatiye dayîn. Dîsa ev amûr di dawîyê de wek pêvek (pêvek 1) hatiye dayîn.

⁶ Bedir Han, C. & Lescot, R, *Kürtçe Gramer* (İstanbul: Avesta Yayınları, 2004), 73, <https://docplayer.biz.tr/8736989-Kurtce-grameri-kurmanci-lehcesi.html>; Tan, S, *Rêzimana Kurmancî*, 3. bs (Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2015), 56; Taş, Ç., *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, 3. bs (Stenbol: Weşanên Dîwanê, 2013), 34; Samur, A., *Kurdîya Kurmancî* (Stenbol: Nûbiha, 2012), 30.

eslî dibe ku di hin formên cuda de derkeve pêşberî me. Dîsa çawa nav-dêra eslî di rewşa dîyar de dikare were bikaranîn her wekî wê dikare di rewşa ne dîyar de jî were bikaranîn. Eger em partîkela îzafeyê li gor zayend, hejmar, dîyarî û nedîyarîyê di nav tabloyekê de bidin wê wiha be;

Tablo 1: Parîkela Îzafeyê di Kurdîya Kurmancî de

Zayend û Hejmar	Dîyar	Nedîyar
Nêr	{-ê}	{-ekî}
Mê	{-a}	{-eke}
Pirjimar	{-ên}	{-ine}

Eger em ji bo her partîkelê mînakekê bidin wê mînakên me wiha bin;

(1)

keç-a	min
N.E. – Îzf.Mê.YJ.	1YJ.TEW.

(2)

derî-yê	mal-ê
N.E. – Îzf.Nêr.YJ	Mal – TEW.Mê

(3)

keç-ên	min
N.E. – Îzf.PJ.	1YJ.TEW.

(4)

keç-ek-e	min
----------	-----

N.E. – Paş.NeDyr.YJ. – Îzf.Notr	1YJ.TEW.
---------------------------------	----------

(5)

deri-(y)ek-î	mal-ê
N.E. – Paş.NeDyr.YJ. – Îzf.Nêr	Mal – TEW.Mê

(6)

keç-in-e	Min
N.E. – Paş.NeDyr.PJ – Îzf.Notr	1YJ.TEW.

Mînaka (1)î ji bo partîkela îzafeyê ya ji bo navdêrên mê yên dîyar, ya (2)yan ji bo parîtkela îzafeyê ya ji bo navdêrên nêr yên dîyar û ya (3)yan jî ji bo partîkela îzafeyê ya ji bo nadêrên pirjimar yên dîyar mînak in. Mînakên din bi rêzê ev in; ya (4)an ji bo nedîyarkirina partîkela îzafeyê ji bo navdêrên mê; ya (5)an ji bo nedîyarkirina partîkela îzafeyê ji bo navdêrên nêr û ya (5)an jî ji bo nedîyarkirina partîkela îzafeyê ji bo navdêrên pirjimar e. Di avaniya îzafeyê de, yanê di ravekê de hin hêman beriya navdêra eslî û hin jî pey navdêra eslî tên. Eger ev rêz bi formulasyonekê ve were dayîn wê wiha be;⁷

Dîyarker (Determiner), Çendîker (Quantifier), Rengdêrên Unvanan, Navdêra Eslî (N.E.) Çendîker (Quantifier), Dîyarker (Determiner), Frazadaçekî (Prepositional Phrase), Frazalêkerî (Verb Phrase), Temamker (Complement), Rengdêr (adjective) Her wekî li jorê jî tê xwîyanê hêmanên beriya navdêra eslî tên; dîyarker, çendîker û rengdêrên unvanê ne û yên pey navdêra eslî tên jî çendîker, dîyarker, frazên daçekî, frazên lêkerî, tamamkar û regdêr in.⁸ Hemanên beriya navdêra eslî tên:⁹

(1) Çendîker;

⁷ Bülbül, M., “Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)” 2, sy 1 (2017): 89-177; Strunk, J., “The Structure of Kurdish Noun Phrase.”, erişim 02 Şubat 2019, https://www.researchgate.net/publication/251783008_The_structure_of_the_Kurdish_noun_phrase.

⁸ “Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)”, 96-104.

⁹ Mînakên jêrîn bi pirani jî Bulbul, 2017 hatiye standin.

hindik	kes
Çendîkera Nedîyar	Navdêra Eslî

Çendîkera nedîyar “hindik” beriya navdêra eslî “kes”ê hatiye.

Çar	dar
Çendîkera Hejmarî	Navdêra Eslî

Çendîkera hejmarî ya “çar” beriya navdêra eslî ya “dar”ê hatiye.

2. Dîyarker (Quantîfier): Mînak:

ev	mase
Nîşander	Navdêra Eslî

Eger ravek di nav hevokê de pêdivî bi rewşa tewandî hebe nîşander ditewe. Wek;

vê	keçik-ê	got
Nîşander.TEW.Mê	Navdêra Eslî.TEW.Mê	Pêveber

3. Rengdêrên Unwanan: Mînak

Berber	Ehmed
Rengdêra Unwanê	Navdêra Eslî

Di mînakê de “berber” wek rengdêra unwanê hatiye bikaranîn û navdêra eslî “Ehmed” terîf kiriye. Hêmanên pey navdêra eslî tên jî di kurdîya Kurmancî de di bin şêş serenavan de tên dabeşkirin:

1. Çendîker (Quantifier): Mînak;

Xwendekar	giş	hatin
-----------	-----	-------

Navdêra Eslî	Çendîkera Nedîyar	Pêveber
--------------	-------------------	---------

Ravekera giş ya çendîker navdêra eslî “xwendekar” terîf kiriye.

mal-a	çar-an
Navdêra Eslî-Îzf.-Mê	Hejmara Rêzê

Hejmara rêzê “çar” pey navdêra eslî “mal” hatiye û wê terîf kiriye.

2. Dîyarker (Determiner): Frazên daçekî û yên lêkerî di nav vê kategorîyê de ne.

Esker-ê	li ber	dêrî
N.E.-Îzf.Nêr.	Daçek	Navdêr.TEW.Nêr

Di vê derê de fraza daçekî ya “li ber dêrî” pey navdêra eslî hatiye û ew reve kiriye.

Jinik-a	ku	mêr-ê	wê	çûye	Hec-ê
N.E.- Îzf.Mê	Gihanek	N.E.- Îzf.Nêr	3YJ.TEW.Mê	Pêveber	Navdêr.- TEW.Mê

Di vê mînakê de hevokek bûye ravekerê navdêra eslî û pey navdêra eslî hatiye.

5. Temamker (Complement): Du curên wê hene. (a) Yên cînavk û (b) yên navdêr.

Yên navdêr re mînak;

Kur-ê	ap-ê	bira-yê	xwişk-a	Xwarizî-ya	... min
N.E.- Îzf.Nêr	N.E.- Îzf.Nêr	N.E.- Îzf.Nêr	N.E.- Îzf.Mê	N.E.- Îzf.Mê	... 1YJ.TEW.

Her wekî di vê mînakê de jî tê dîtin, navdêra eslî dikare heta hetayî bi navdêran ve were terîfkirin. Di vê derê de her navdêra tamamker

partîkela îzafeyê digire û ji bo navdêrên pey xwe tîn dibe navdêra eslî lê bi temamî ji bo navdêra herî pêşî dibe raveker. Ji bo yên rengdêr mînak;

keçik- a	rind	û	be- jinbilind	û	porkej	û	navqendîl ...
N.E.- Îzf.Mê	rengdêr	gihanek	rengdêr	gi- hanek	reng- dêr	gi- hanek	Rengdêr

Her wekî ji vê mînakê jî hatî dîtin rengdêr wexta navdêra eslî rave dikin ji hêla teorîk ve dikarin heta hetayî li wê navdêrê zêde bibin.

Di Kurdîya Kurmancî de Fonksiyonên Partîkela Îzafeyê

Di kurdîya kurmancî de sê fonksiyonên partîkela îzafeyê hene. Ev fonksiyon fonksiyona girêdanê (adnominal linking), fonksiyona anaforîk (demonstrative/anaphoric) û fonksiyona demî (îzafeya berfirehbûyî) ne. Di kurdîya kurmancî de partîkela îzafeyê ku taybetiyeke morfolojîya navdêrî ye, ber bi morfolojîya lêkerî berfireh bûye ku ev fonksiyona demî ye. Ji bo vê jî têgeha nîşankera demî (tense marker) hatiye bikaranîn.¹⁰

Fonksiyona Girêdanê ya Partîkela Îzafeyê

Di vê fonksiyonê de partîkela îzafeyê hêmana ku pey navdêra eslî tê bi navdêra eslî ve girê dide. Wexta hêmana raveker bi navdêra eslî ve tê girêdan, partîkela îzafeyê ji hêla zayend û hejmarê ve alomorfen cuda bikar tîne. Her wekî li jor jî hatî behskirin, îzafeya girêdanê çendîkeran, temamkeran, rengdêran, frazên daçekî û lêkerî bi navdêra eslî ve girê dide. Wek;

yar -a	min	a	es- mer	a	ji	Mûş-ê	a	ku duh hat
N.Eç- Îzf.Mê	Cîna vk	Îzf. Mê	Reng dêr	Îzf.M ê	Daçe k	Navdêr- TEW.Mê	Îzf. Mê	Fraza Lêkerî

¹⁰ "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle", 368-69.

Her wekî ji mînakê tê dîtin navdêra eslî "yar" cînavk, rengdêr, fraza daçekan û fraza lêkerî standiye û hemû jî bi partîkela îzafeyê ve hatine girêdan.

Di vê derê de divê were zanîn tu ravekerên pey navdêra eslî tîn bi navdêra eslî re nakevine nava rêkkeftinê. Divê ev rêkkeftina partîkela îzafeyê ya bi navdêra eslî re bi rêkkeftina di kurdîya zazakî de heyî re neyê tevlihevkin. Lewra di kurdîya zazakî de rengdêr bi navdêra eslî ya ravekê re dikevîne rêkkeftine.¹¹

Fonksiyona Anaforîk

Partîkela îzafeyê di Kurmancî de bê ku navêra eslî hebe, dikare were bikaranîn. Di vê rewşê de partîkela îzafeyê peywira navdêrîkirinê hildide. Yanê di fonksiyona anaforîk de partîkela îzafeyê di derveyê fraza ku aîdê wê ye, tê bikaranîn. Wek;¹²

Tu	kîjan	hesp-î	di-bîn-î?	
2YJ.RST.	Bêjeya Pirsê	Nvd-TEW.Nêr.	Pêş.d.n.-dîtin:k.d.n.-2YJ	
Yê	Soro	/ yê	min	...
Îzf.Anf.Nêr	Raveker	/ Îzf.Anf.Nêr	1YJ.TEW.	...

Di vê mînakê de "yê"ya berîya "Soro" hatî û "yê"ya berîya "min" hatî mînak e ji bo fonksiyona anaforîk ya îzafeyê. Lewra ev parîtkel bê navdêra eslî hatine bikaranîn û navdêra eslî nîşan didin. Fonksiyona girêdanê ya partîkela îzafeyê û fonksiyona anaforîk ya partîkela îzafeyê gelek nêzîkê hevdu ne û hin caran dibe ku tevlihev bibin. Cudahîya di navbera wan de hin caran bi navberên kurt ve dikare derkeve meydanê. Mesela;¹³

Bira-yê	min	ê	mezin	e.
N.E.-Îzf.Nêr	1YJ.TEW	Îzf.Nêr	Rengdêr	Kopula.3YJ

¹¹ Malmîsanij, M., *Kurmanca İle Karşılaştırmalı Kirmanca (Zazaca) Dilbilgisi* (Stenbol: Vate, 2015), 113; Kirkan, A., "Zazakî de Zayend", *Bingöl Üniversitesi Bingöl Araştırmaları Dergisi* 6, Sy 2 (2020): 157.

¹² *Kürtçe Gramer*, 199.

¹³ "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle", 368-69.

Bira-yê	min	(I)	ê	mezin	e.
N.E. – Îzf.Nêr	1YJ.TEW	Navbera kurt	Îzf.Anf.Nêr	Rengdêr	Kopula. 3YJ.

Di mînaka yekem de “birayê min ê mezin e” pêveber e û mena “Ew birayê min mezin e” dide. Di mînaka duyem de pêveber “ê mezin e”ye. Kirde “birayê min” e. Yanê mena “Yê mezin birayê min e” di hevokê de heye. Ev mene bi navbera kurt a pey “min” û beriya “ê”yê ve hatiye dayîn.

Fonksîyona Îzafeya Berfirehbûyî (Nîşankera Demî) ya Parîkela Îzafeyê

Di beşa jorîn de behsa nêzîkbûna fonksîyona girêdanê û ya ana-forîk hate kirin. Ev nêzîkbûn ji hêla Haig ve wek çavkaniya îzafeya berfirehbûyî tê nîşandan.¹⁴ Ew ê li jêrê bi berfirehî behsa vê fonksîyonê were kirin, lewra jî em ê li vir kurt bibirin.

Paşxaneya Teorîk ya Avaniya Îzafeyê

Di vê beşê de wê behsa xebatên li ser îzafeyê bê kirin. Xebatên li ser îzafeyê hatî kirin, bi pîranî li ser zimanê Farisî hatiye kirin. Loma jî beriya ku behsa van xebatan were kirin, wê pêşîyê behsa avaniya îzafeyê di Farisî de were kirin.

Di Farisî de Avaniya Îzafeyê

Di Farisî de partîkela îzafeyê di fonksîyona girêdanê de tê bika-ranîn. Partîkela îzafeyê pey navdêra eslî tê û ravekeran bi navdêra eslî ve girê dide. Raveker dikarin bibin rengdêr, cînavk, navdêr, hin nav-dêrên taybetiyên navdêraeslî didin û hin firazên daçekî.¹⁵ Wek;

(1)

lebas-ê	zîba
kinc-Îzf.	rind

¹⁴ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”.

¹⁵ 376-77.

Kincê rind

(2)

lebas-ê	Meryem
kinc-Îzf.	Meryem
Kincê Meryemê	

(3)

lebas-ê	arûsî
Kinc-Îzf.	dewet
Kincê dewetê	

(4)

lebas-ê	bî	astîn
Kinc-Îzf.	bê	mil
Kincê bêmil		

Di (1)î de rengdêr, di (2)yan de navdêr, di (3)yan de navdêreke taybetî-ya navdêra eslî dayî û di (4)an de jî wek frazeke daçekî dertê pêşberî me. Ravekên zincîrî çawa di Kurmancî de heye, her wekî wê di Farisî de jî heye. Wek,

ketab-ê	tarîx-ê	sebz-ê	bî	erzîş-ê	Meryem
Pirtûk-Îzf.	dîrok-Îzf.	Kesk-Îzf.	bê	qiymet-Îzf.	Meryem
Pirtûka Meryemê ya dîrokê ya hêşîn ya bê qiymet					

Cudahîya di navbera raveka zincîrî ya Farisî û ya Kurmancî de ev e ku navdêrên me'na xwedîtîyê dide di Farisî de di dawî de tê lê di Kur-

mancî de pey navdêra eslî tê. Dîsa, di Kurmancî de frazên lêkeran di-karin navdêra eslî terîf bikin lê di farisî de nikarin. Wek,

(1) Di Farisî de Frazê Lêkerî ya di Avaniya Îzafeyê de*

Zen -ê	ke	men	did-em*
Jin -Îzf	ku	Ez/min	Dîtin: k.d.b.-1YJ.
Jina ku min dît.			

Ev avaniya di mînaka jorîn de hatî dayîn di Farisî de avaniyeke çewt e. Lê her wekî ji wergera wê jî tê dîtin, di Kurmancî de avaniyên bi vî rengî gelek hêsan dikarin werin çêkirin. Cudahîyeke din ya di navbera avaniya Îzafeyê ya Farisî û ya Kurmancî de ew e ku di Kurmancî de paşgira nedîyariyê dikare pey navdêra eslî were û paşê jî partîkela îzafeyê pey wê paşgirê were, lê di Farisî de ev ne mumkun e.

(1) Avaniya ku ji bo Farisî ne mumkun e:

Zen-î-yê	ziba
Jin-Paşgira Nedîyariyê-Îzf.	Rind
Jineka rindik	

(2) Avaniya ji bo Farisî mumkun e:

yek	zen-ê	zîba
yek	Jin-Îzf.	Rind
Jineka rindik		

Her wekî ji mînakan jî dîyar e, di (1)î de pey paşgira nedîyariyê partîkela îzafeyê hatiye bikaranîn, lê ev li gor gramera Farisî çewt e. Lê di (2)yan de avaniya rast ya ji bo Farisî hatiye bikaranîn. Ji wergerên van mînakan dîyar e ku ev avani di Kurmancî de gelek rihet tê bikaranîn. Wek dawî em dikarin bêjin fonksiyona anaforîk ya partîkela

îzafeyê di Farisî de nayê bikaranîn lê di Kurmancî de gelek rihet tê bikaranîn.

Ravekirinên Teorîk yên li ser Avaniya Îzafeyê

Ji bo îzahata teorîk ya îzafeyê gelek nivîskar hewl dane ku wê li ser bingehekê dayînin. Hin ji van nivîskaran bi teorîya “Fraza Dîyarker” (Determiner Phrase (DP)) xwestine çarçoveyekê ji bo partîkela îzafeyê dayînin û hin jî bi ravekên navdêrî û hinekên din jî bi ravekên rengdêrî ve xwestine bigihêjin vê armancê. Samiian¹⁶ û Ghomeshi¹⁷ partîkela îzafeyê ji morfemekê wêdetir wek fonemeke xwedî fonksiyoneke fonolojîk dîtine ku peywira girêdanê bi cih tîne. Ew xwestine di nav avaniya X barê de meneyekê bidine vê partîkelê. Li gor Ghomeshi, lewra di Farisî de ravekerê temamker di dawiya avaniya îzafeyê de tîn û pey wan tu raveker nayên bikaranîn, Ghomeshi xwesîtye wê bi vî awayî nîşan bide non-projection/ N⁰-level. Li gor wê, lewra temamker tîn dawiya avaniya îzafeyê, loma jî hemû avani wek navdêrekê di nav hevokê de miamele dibîne. Dîsa li gor wê, wexta di nav avaniya îzafeyê de ravekera temamker tunebe, wê demê partîkela îzafeyê tenê fonksiyona girêdanê hildigire. Lê her wekî me li jor jî behs kir, di Kurmancî de ravekera temamker pey navdêra eslî tê bikaranîn û pey ravekera temamker ravekerên din jî tîn. Loma jî dikare were gotin ku ev pêşniyazî li gor avaniya îzafeyê ya Farisî hatiye gotin û ravekirineke sînordar e. Dîsa Ghomeshi îddîa dike ku di nav avaniya îzafeyê de frazên daçekî tunene. Lê Samvelian¹⁸ vê îddîayê pûç dike. Hem ji Farisî hem jî ji zimanên din yê Îranî mînakên ji bo bikaranîna fraza lêkeran ya di nav avaniya îzafeyê de tîne.¹⁹ Ji bo ravekirina teorîk ya avaniya îzafeyê Samiian²⁰ û Larson û Yamakido jî bi îddîayekê ve tîn. Li gor wan partîkela îzafeyê ji bo ravekera pey xwe tê dibe îşareta rewşê. Mesela,

mal-	-a	rind
------	----	------

¹⁶ Samiian, V., “The Ezafe Construction: Some Implications for the Theory of X-Bar Syntax”, içinde *Persian Studies in North America* (Maryland: Iranbooks, t.y.), 17-41.

¹⁷ Ghomeshi, G., “Non-Projecting Nouns and the Izafe Construction in Persian”, *Natural Language and Linguistic Theory*, 1997, 729-88.

¹⁸ Samvelian, P., “A (Phrasal) Affix Analysis of the Persian Ezafe.”, *Journal of Linguistics* 43 (2007): 605-645.

¹⁹ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”, 379-80.

²⁰ Larson, R. K. & Yamakido, H., “Zazaki ‘Double Ezafe’ as Double Case-marking.”, . . *LSA. Albuquerque.*, erişim 01 Mart 2019, <http://semllab5.sbs.sunysb.edu/~rlarson/lsa06ly.pdf>.

N.E.-	-Îzf.Mê	rengdêr
-------	---------	---------

Di vê mînakê de navdêra eslî “mal” e û raveker “rind” jî bi gireya rewşê (ku di vir de –a ye) bi navdêra eslî ve hatiye girêdan. Yanê, di vê rewşê de partîkela îzafeyê wek perçeyeke navdêra eslî nehatiye qebûl-kirin lê wek îşareta rewşê ya ravekerê hatiye qebûl-kirin. Larson ve Yamakido ji bo piştgirîya vê îddaya xwe behsa cotrewşa (suffixauf-name) di Zazakî de kirine. Cotrewşa di Zazakî de bi vê mînakê ve dikare were terîfkirin;²¹

kutik-	-ê	(embiryan-	-dê	ma)
kûçik-	-Îzf.Nêr	(cîran.TEW.PJ.-	-cotrewş.Nêr	1PJ.TEW
Kûçikên cîran(an)ên me.				

Di vê derê de du ravekên resen hene: “kûçikên cîranan” û “cîranên me” û bi yekbûna van ve ravekeke zincîrî hatiye avakirin, (kûçikên cîran(an)ên me). Di vê derê de di raveka resen ya ewil de “-ên” wek îşareta rewşê ya “cîranan” hatiye dîtîn û bê ku –an’a tewangê ji holê rabe raveka resen ya duyem “cîranên me” bi raveka ewil ve bûye yek. Di vê rewşê de jî “-dê” wek îşareta rewşê ya “ma”yê hatiye qebûl-kirin. Yanê di Kurmancî de her çi qas “-an”a îşareta tewangê di ravekên zincîrî de ji holê rabe jî di Zazakî de ev ji holê ranebûye û ji vê rewşê re jî cotrewş (suffixaufname) tê gotin. Di encama van terîfên xwe de Larson û Yamakido²² îddîa dikin ku rewşa “pêşdaçeka gelenperî ya genetîf” (generalized genitive preposition) bi îzafeyê ve tê çêkirin.

Bi îddîaya Larson û Yamakido ve ravekên zincîrî bi rehetî dikarin terîf bibin. Ev wek avantajeke vê îddîayê dikare were dîtîn. Lê dezavantajên wê jî hene. Mesela di Kurmancî de raveker wexta rengdêr be ev rengdêr tu paşgirên kêşandî nastîne. Lewra ev tewandin pêk nayê, ev wek kêmasîyeke vê îddîayê dikare were dîtîn. Her çiqas Lar-

²¹ Todd. T. L, *A Grammar of Dimilli (Also Known As Zaza)* (University of Michigan: Ann Arbor, 2008).

²² “Zazaki ‘Double Ezafe’ as Double Case-marking.”

son û Yamakido²³ xwestine vê kêmasîyê bi “avanîya gerdûnî ya fraza lêkeran” ve terîf bikin, ev terîf ji hêla Haig ve hatiye rexnekirin.²⁴

Wek dawî em dikarin behsa îddîayên Samvelian²⁵ bikin. Samvelianhem îddîayên Gomeishi hem yên Samian²⁶ hem jî yên Larson û Yamakido²⁷ red dike. Li gor wî, divê partîkela îzafeyê ji hêla gramatîk ve were nirxandin. Yanê ji terîfeke sentaktîk wêdetir divê bi terîfeke morfolojîk ve were teorîzekirin. Li gor wî, partîkela îzafeyê paşgirek e û perçeyeke navdêra eslî ye. Loma jî hem ji aliyê fonksiyonel hem jî prosodîk ve perçeyeke navdêra eslî ye. Bi vê îddîaya xwe ve Samvelian²⁸ problema ravekerê ya fraza lêkerî ji hole rakirîye. Wek encam eger partîkela îzafeyê tenê bi avaniya wê ya di Farisî ve were nirxandin, ji hêla teorîk ve gelek arîşe derdikevin holê. Lê nêrîneke tarîxî wê ji bo terîfeke berfirehtir fikrên baştir bide.

Di Zimanên Berê yên Îranî de Avanîya Îzafeyê

Di derbarê eslê îzafeyê ya leksîkal de di destê me de tu agahî tunene. Lê di zimanên berê yên Îranî de hin element hene ku di derbarê îzafeyê de agahî didin. Li gor hin çavkaniyan eslê partîkela îzafeyê cînavka pêwendîyê (relative pronoun) e. Di zimanên berê yên Îranî de, di frazên lêkerî de bi piranî kopula nedihat bikaranîn. Ji Farisîya berê mînakêk;²⁹

(...)Dârayavaum	hya	manâ	pitâ
Dariyus. AKZ.	hya. Nêr. NOM	1JY. GEN.	bav
(...) Dariyus ê ku bavê min e.			

Di vê derê de cînavka pêwendîyê “hya” (Nêr.NOM) fraza lêkerî bi navdêr re girê daye. Lê kopula nehatiye bikaranîn. Yanê cihê ku wek “Dariyusê ku bavê min e” were gotin “Dariyusê ku bavê min” hatiye gotin. Ev cînavka pêwendîyê “hya” bi demê re, taybetiya xwe ya temamkeriyê (complementize) winda kiriye û; li gor Larson û Yamakido³⁰

²³ “Zazaki ‘Double Ezafe’ as Double Case-marking.”

²⁴ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”, 379-81.

²⁵ “A (Phrasal) Affix Analysis of the Persian Ezafe.”

²⁶ “The Ezafe Construction: Some Implications for the Theory of X-Bar Syntax”.

²⁷ “Zazaki ‘Double Ezafe’ as Double Case-marking.”

²⁸ “A (Phrasal) Affix Analysis of the Persian Ezafe.”

²⁹ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”, 383.

³⁰ “Zazaki ‘Double Ezafe’ as Double Case-marking.”

wergeriyaye “îşareta rewşî ya genetîf”, li gor Karimi bûye “fraz a pêveberî”; li gor Dikken û Singhapreecha (2004) bûye “girêder”ekê (linker). Lê ev analîza ku cînavka pêwendîyê dixwe merkeza xwe ji bo Soranî û Farisî dibe ku gelek pirsgirikên terîfkirinê ji holê rake lê wexta partîkelên îzafeyê yê Kurmancî û Zazakî jî di nav mijarê de tên nirxandin hin aliyên vê yê kêm derdikevin meydanê. Ev mînak ji Farisîya berê wê ji bo qesta Haig alîkarê me bibe;³¹

hya	tauvîy ā	tyam	skauθim	naiy	jatiy
Nêr.NOM	bihêz	Nêr.AK Z	bêhêz.AKZ	Neyînî.	Bêjeya Subjunctivê
Yê biquwet bila ezîyetê yê bêquwet neke.					

Di vê mînakê de “hya” û rewşa wê ya akkuzatif “tyam” ji bo navdêrîkirina rengdêrên “bihêz” û “bêhêz” hatine bikaranîn ku di Kurmancî de jî heman tişt bi partîkela îzafeyê “yê”yê ve çêbûye. Partîkeleke wek partîkela “Hya”yê di zimaneke din ya Îranî Avestayî de jî heye. Ev partîkela “ya-”yê ye. Ev herdû partîkel wek hev tene bikaranîn. “ya-” ji “hya”yê cudatir bê ku navdêra eslî ya avanîya îzafeyê were bikaranîn dîsa di fonksiyona cînavka pêwendîyê de dikare were bikaranîn. Mesela:

yō	miðram	aiwi.družaiti	yim	vacahinəm
ya.Nêr.NOM	peyman.AKZ	şikandin:k.d.n.	ya.AKZ	Bi gotin. AKZ
Yê ku peymanê dişikêne ya ku bi gotinê (hatî çêkirin).				

“ya”ya ewil bê ku navdêra eslî were bikaranîn wek cînavka pêwendîyê hatiye bikaranîn û “ya”ya duyem li derveyê girava fraziya xwe hatiye bikaranîn û wek cînavka pêwendîyê hatiye bikaranîn. Di wergera wê ya Kurmancî de jî heman tişt heye. Wek dawî dikare were gotin ku Haig bi terîfên morfolojîk an jî sentaktîk zêdetir bi perspektîfeke dîrokî ve xwestiyê partîkela îzafeyê li ser bingeheke terîk dayîne.³²Encama ku ew gihîştîye ev e ku partîkela îzafeyê tenê di

³¹ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”.

³² “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”.

fonksîyona cînavka pêywedîyê de nehatiye bikaranîn lê di fonksîyona navdêrîkirin û nîşankerîyê de jî hatiye bikaranîn. Dîsa gotiye ev taybetî hêj di Kurmancî de parastî ne.

Îzafeya Berfiehûyî (Extended Ezafe)

Îzafeya berfirebûyî di hin devokên Kurmancî de wek perçeyeke pêveberê tê bikaranîn. Pêveber dikare bibe hem pêvebereke navdêrî û hem jî bibe pêvebereke lêkerî. Di xebatên kurdolojîyê de herî ewil MacKenzie (1962) behsa vê partîkelê kirîye. Ew wexta xebatên xwe yê kurdolojîyê dikir, li mintîqa Akre û Surçîyê rastê vê bikaranînê hatiye. Ew dibêje wexta ev partîkel bi dema niha ve tê bikaranîn, meneya berdewamiyê dide hevokê.³³Lê ew tu navekê ji bo vê partîkelê bikar nehanîye û wek îzafeya di fonksîyona nîşnadayînê de binav kiriye. Lêkolêreke din ya ku behsa îzafeya berfirehbûyî kirîye Bailey e. Ew dibêje ev partîkel meneya raweya ragihandinê û meneyeke teqesbûnê li hevokê zêde dike.³⁴

Lêkolêrekî din ya ku behsa îzafeya berfirehbûyî dike Haig e.³⁵ Ji bo vê partîkelê Haig terma îzafeya demê (tense ezafe) bikar anîye. Lewra îzafeya berfirehbûyî hem bi hevokên navdêrî hem jî bi hevokên lêkerî re tê bikaranîn. Sahin³⁶ bêjeya îzafeya berfirehbûyî (extended ezafe) ji bo vê partîkelê bikar anîye. Loma jî di vê xebatê de wê ev terma dawî îzafeya berfirehbûyî ji bo vê partîkelê were bikaranîn. Di vê qismê de wê ewil li ser eslê îzafeya berfirehbûyî were sekinîn. Paşê wê li ser bikaranîna vê partîkelê li mintîqayên Tor, Behdînan û Maraşê were sekinîn. Dawîyê de jî wê behsa amûreke pîvandîna ya ji bo vê partîkelê hatî pêşxistin were kirin.

Terîfa Îzafeya Berfirehbûyî

Terîfa îzafeya berfirehbûyî herî baş ji hêla Haig³⁷ ve hatiye terîfkirin. Loma jî di vê beşê de wê ew çavkanî wek referans bîndan. Li gor wî, di vê fonksîyona parîkela îzafeyê de partîkela îzafeyê ji sînorên morfolojîyê derketiye û ber bi sînorên sentaksê berfireh bûye.

³³ Sahin, R., "Extended Ezafe Particles in Tor Kurdish" (Master, Sweden, Uppsala University, 2018), 15.

³⁴ "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle", 375.

³⁵ "Alignment Change in Iranian Languages. A Construction Grammar Approach"; "The Emergence of the Tense Ezafe in Bahdînî Kurdish."; "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle".

³⁶ "Extended Ezafe Particles in Tor Kurdish".

³⁷ "The Emergence of the Tense Ezafe in Bahdînî Kurdish."; "Alignment Change in Iranian Languages. A Construction Grammar Approach"; "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle".

Ev taybetî di hin zimanên Asyaya Dûr de jî heye.³⁸ Ji bo fêmkirina terîfa îzafeya berfiebûyî em ê di serî de hin mînakên vê bikaranînê bidin û paşê jî wan binirxînin.

(1)

xuşk-	-a	min	ya	çû-	-î	sîk-	-ê
N.E.-	-Îzf.Mê	1YJ.TEW	Îzf. Nêr	Çûn:k.d.b.	-partîsîp	Nvd. -	-TEW. Mê

(2)

Mistefa -	-y	kişk-	-ek	a	heye
N.E.-	-TEW. Nêr	N.-	Paş.Nedyr	Îzf.Brf.Mê	Hebûn:k.d.n.3YJ

(3)

Got-	-ê	ku	şah-	-ê	wan	yê	mir-	-î
Gotin: k.d.b.	-partîkel	Gih.	N.E.-	-Îzf. Nêr	3PJ. TEW	Îzf. Brf.	Mirin: k.d.b.	-partisip

(4)

hal-	-ê	wî	ê	keftî-	-ye
N.E.-	-Îzf.Nêr	3YJ.TEW. Nêr	Îzf.Brf.	ketî-	-kopula. 3YJ.

(5)

Ew	(y)êt	kurd	in
3YJ.RST.	Îzf.Brf.	Kurd	kopula. 3PJ.

³⁸ "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle", 170-71.

Wekî partîkela îzafeyê ya di fonksiyona girêdanê de, îzafeya berfirehbûyî jî ji hêla zayend û hejmarê ve tê kişandin. Loma jî di mînakên (1) û (2)yan de îzafeya berfirehbûyî wek mê, di (3) û (4)an de wek nêr û di (5)an de jî wek pirjimar hatiye kişandin. Îzafeya berfirehbûyî wexta di dema niha de tê bikaranîn, bi wan pêveberan ve tê bikaranîn ku ji hêla meneyî ve rewşekê (state), hebûnekê (existential) û cihekê dîyar dikin. Ji bo pêveberên rewşek (state) mînaka (4)an; ji bo mena hebûnê (existential) mînaka (2)yan dikare wek mînak were dayîn. Di (4)an de pêveber “keftî” ye yanî rewşek e, loma jî îzafeya berfirehbûyî hatiye bikaranîn. Ji bilî van îzafeya berfirehbûyî bi partîsîpên encamî ve jî tên bikaranîn. Mînakên jorê yên (1) û (3)yan ji bo partîsîpên encamî dikarin wek mînak werin nîşandan. Bi gotineke din, îzafeya berfirehbûyî bi pêveberên me’na hereketê zêdetir bi pêveberên rewşî ve tê bikaranîn. Dîsa, îzafeya berfirehbûyî zêdetir di dema niha de tê bikaranîn. Eger îzafeya berfirehbûyî bi partîsîpekê ve bê bikaranîn, me’na encambûnê û eleqeya wê ya bi dema niha ve dide. Mesela di (1)î de bi “keça wan” “çûyî sîkê” ve tiştê hatî qestkirin; yanê, keç çûye û ev bûyer qediyaye û eleqa wê hevokê bi dema niha re heye.³⁹ Îzafeya berfirehbûyî bi pêveberên lêkerî re jî tê bikaranîn. Wexta bi lêkerên kêşandî ve tene bikaranîn wê meneyê didin ku ew bûyer di wê demê de pêk tê. Mesela,

Ez	yê	xwar-in-	-ê	çê-	-di-	-k-	-im
1YJ.RST.	Îzf.Br.f.N êr	Nvd.-	-TEW. Mê	Pêşgir-	- pêş.RGH-	- k.d.n. -	-1YJ.

Her wekî tê zanîn di Kurmancîya standart de ji bo dema niha û deman fireh, ji hêla morfolojîk ve tenê formekê tê bikaranîn. Lê di vê mînakê de bi bikaranîna îzafeya berfirehbûyî ve me’neya dema niha ya xwîyanga berdewamîyê hatiye dayîn. Eslê îzafeya berfirehbûyî partîkela îzafeyê ya di fonksiyona anaforîk de ye. Lewra îzafeya berfirehbûyî jî îşaretê navdêra beriya xwe dike. Meslela eger li mînaka (4)an were nihêrîn wê bê fêmkirin ku partîkela îzafeya berfirehbûyî “ê” îşaretê navdêra beriya xwe ya “hal” kiriye ku ev navdêreke nêr e. Hağ dibêje ev tişteke wisa kompleks nîne ku neyê fêmkirin. Li gor wê mesela di mînaka (4)an de, mijara hevokê (topîk) “halê wî” ber bi çepê şiqitîye

³⁹ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”.

(left-dislocated topic). Di encama vê de jî partîkela “ê”yê îşaretê mijara hevokê bi awayeke anaforîk dike. Rewş wiha dikare were terîfkirin;⁴⁰

[Halê wî] Mijar [ê (elementa anaforîk-kirde keftî ye] Hevok
Yanê eger şiqitîna ber bi çepê çê nebe rewşa normal ev e;

ê	keftî	hal-	-ê	wî	ye
Îzf. Ana- forîk	keftî	hal-	-Îzf.Nêr.	3YJ.TEW.	kopula. 3YJ.

Di vê rewşê de mijara hevokê di nav girava hevokê de dimîne. Dûre, mijar “halê wî” ber bi çepê dişikite û dibe kirdeya sentaktîk. Di encamê de jî îzafeya anaforîk wek partîkela pêveberê dimîne. Bi vê halê xwe yê dawî ve aspekteke perfektîf li hevokê zêde dike û bi hevokên navdêrî ve tê bikaranîn. Paşê jî ber bi hevokên lêkerî berfireh bûye. Wexta bi lêkeran re jî tê bikaranîn me’na “berdewamîyê” li hevokê zêde dike.

Îzafeya Berfirehbûyî di Devokên Kurmancî de

Xebata herî berfireh ya di derbarê bikaranîna îzafeya berfirehbûyî ya devokên kurmancî de ji hêla Şahîn⁴¹ ve hatiye kirin. Di vê xebatê de li ser devokên Tor, Behdînan û Mereşê hatiye sekinîn. Di hin devokan de cihên bikaranîna îzafeya berfirehbûyî dibe ku berfirehtir û di hinekên din de jî tengtir be. Dîsa dibe ku partîkel ji hêla fonolojîk ve ji hev cuda bin. Di vê beşê de formên îzafeya berfirehbûyî di çarçoveya xebata Şahîn de, wê bi tabloyan were dayîn.

Di devoka Torê de du grub hene; Gruba A û ya Byê.

Tablo 2: Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Torê de, Gruba Ayê

	Mê	Nêr
Şexsê Yekem û Duyem yê Yekjimar	î	
Şexsê Sêyem yê Yekjimar	a	î

⁴⁰ “Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle”.

⁴¹ “Extended Ezafe Particles in Tor Kurdish”.

Pirjimar	a
----------	---

Tablo 3: Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Torê de, Gruba Byê

	Mê	Nêr
Şexsê Yekem û Duyem yê Yekjimar	ê	
Şexsê Sêyem yê Yekjimar	a/wa/ya	ê/wê/yê
Pirjimar	ê/wê/yê	

Her wekî ji tabloyan jî tê dîtîn, hem di gruba Ayê de û hem jî di gruba Byê de îzafeya berfirehbûyî ji hêla zayend û hejmarê ve hessas e. Di gruba Ayê de pirjimar wek navdêrên mê rêkkeftin nîşan didin lê di gruba Byê de rekkeftina navdêrên pirjimar wek navdêrên nêr in. Îzafeya Berfirehbûyî ya di devoka Behdînan de ji hêla fonolojîk ve wek partîkela îzafeyê ya di fonksiyona girêdanê de ye.

Tablo 4: Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Behdînan de

	Îzafe	Îzafeya Berfirehbûyî
Nêr	-(y)ê	-(y/w)ê
Mê	-(y)a	-(y/w)a
Pirjimar	-(y)êt/t	-(y/w)êt/d

Her wekî ji tabloyê jî tê fêmkirin îzafeya berfirehbûyî wek îzafeya girêdanê û ya anaforîk ji hêla zayend û hejmarê ve hessas e. Lewra ji vê tabloyê nayê fêmkirin ku ka gelo cînavkên şexsî ji hêla zayendê ve hessas in an na. Lê di vê xebatê de lewra li ser vê heremê hatiye sekinîn, wê li jêrê behsa wê were kirin. Di devoka Maraşê de îzafeya berfirehbûyî ji îzafeya di fonksiyona girêdanê û di fonksiyona anaforîk de cudatir e.

Tablo 5: Di Devoka Mereşê de Partîkela Îzafeyê ya di Fonksiyona Girêdanê û ya Anaforîk de

	Nêr	Mê	Pirjimar
Dîyar	-î/-ê	-ê / -o	ê
Nedîyar	î	ê	e
Fonksîyona Anaforîk	î	o	ê

Tablo 6: Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Mereşê de

	Nêr	Mê
Şexsên Yekjimar	î	ê
Şexsê Pirjimar yê Yekem û Duyem	-e	
Şexsê Pirjimar yê Sêyem	-ê	

Di devoka Mereşê de îzafeya berfirehbûyî ji hêla zayend, hejmar û kes ve hessas e. Di şexsên yekjimar de hemû şexs ji hêla zayêndê ve tên kişandin. Di şexsên pirjimar de jî şexsê yekem û duyem ji şexsê sêyem cudatir tên bikaranîn. Di devokeke Kurmancî ya li Kafkasyayê de em rastê îzafeya Berfirehbûyî tên. Materyalên vê devokê ji pirtûka Emerîkê Serdar ya “Êdî Dereng Bû” hatiye standin.⁴²

Tablo 7: Îzafeya Berfirehbûyî di Devokeke Kurmancî ya Kafkasyayê de

	Nêr	Mê
Şexsê Yekem û Duyem yê Yekjimar	î	
Şexsê Sêyem yê Yekjimar	e	î
Pirjimar	î	

Her wekî ji tabloyê jî tê dîtin îzafeya berfirehbûyî di devoka Kafkasyayê de ji hêla zayêndê ve hessas e lê ji hêla hejmarê ve ne hessas e. Niha jî wê taybetiyên îzafeya berfirehbûyî yên di devokên Kurmancî yên hatî dayîn de bi tabloyekê ve bê berawirdkirin.

⁴² Serdar, E., Êdî Dereng Bû”. 2015.

Tablo 8: Taybetîyên Îzafeya Berfirehbûyî di Devokên Kurmancî de

Îzafeya Berfirehbûyî	Devoka Torê	Devoka Behdînan	Devoka Maraşê
(1) Li gor pêvebera hevokê	Diguhere	Naguhere	Naguhere
(2) Bi pêveberên navdêrî ve	Nayê bikaranîn	Tê bikaranîn	Nayê bikaranîn
(3) Pêveberên navdêrî hem di dema niha û hem jî dema borî de	Bikar tînin	Bi kar tînin	Bi kar tînin
(4) Di pêveberên lêkerî de nuansa wext û aspektê	Dide	Dide	Dide
(5) Bi raweya dananî (Subjunctive) ve	Tê bikaranîn	Tê bikaranîn	Tê bikaranîn
(6) Bi pêveberên lêkerî yên dema borî û dema niha ve	Tê bikaranîn	Tê bikaranîn	Tenê dema niha
(7) eger bi pêveberên cihî ve were bikaranîn kopula	Ji holê ranabe	Ji holê radibe	Ji holê ranabe
(8) Mena berdewamîyê li hevokên lêkerî	Zêde dike	Zêde dike	Ne dîyar e.
(9) Di navbera kirde (hin caran bireser) û partîkelê de rêkkestin zayendî	Tenê di şexsê sêyem yê yekjimar de heye	Heye	Heye
(10) Bi hevokeke neyînî ve ya di dema niha de hatî kişandin	Nayê bikaranîn	Tê bikaranîn	Nayê bikaranîn (di hevokên navdêr de)
(11) Mena prospektîfê	Dide	Nade	Ne dîyar e.
(12) Bê ku kirde were bikaranîn di fonksiyona anaforîk de	Nayê bikaranîn	Tê bikaranîn	Tê bikaranîn

Her wekî ji tabloyê jî tê dîtin cihê bikaranîna îzafeya berfirehbûyî li gor devokan hin caran cudahîyan nîşan dide. Ji bo hemû cihên bikaranîna îzafeya berfirehbûyî divê amûreke pîvandîne bê pêşxistin ku niha jî wê behsa wê bê kirin.

Amûra Pîvandîne ya Îzafeya Berfirehbûyî

Amûra pîvandîne ya ji bo vê lêkolîne hatî pêşxistin divê bikaranîna îzafeya berfirehbûyî ji hemû aliyên xwe ve di hundirê xwe de bihewîne. Pirsînê vê amûra pêvandîne Tirkî hatine pirsîn û bersivên wan bi kurdîya kurmancî hatine standin. Ev amûra pîvandîne îzafeya berfirehbûyî ya devoka Torê wek bingeh digire. Lewra ev bikaranîn bikaranîna herî berfireh e. Ji bilî bikaranîna vê devokê, hin taybetiyên din henin ku di devoka Torê de tune lê di devokên din de hene, ew jî li vê amûra pîvandîne hatine zêdekirin.⁴³

Gruba Ayê ya vê amûrê du beş in: (1) pêveberên navdêrî yên di raweya ragihadinî de û (2) pêveberên navdêrî yên di raweya dananî de. Grube (1)em pêşiyê li gor dema niha û dema borî hatiye dabeşkirin. Erênîtî, neyînîtî û pirsyarîtî vê dabeşkirina demî hatiye zêdekirin. Wek dawî ji bo vê dabeşkirinê, pêveberên navdêrî wek yên rengdêr û yên daçek hatine dabeşkirin. Gruba (2)yem jî raweya dananî di bin beşên ferzkirin, şert, nesîhet û lenet de dabeş kirîye. Gruba Byê jî ji du bin-beşan pêk tê: (1) kopulayên ku cih dîyar dikin û (2) hevokên lêkerî. Gruba (1)em bin du beşan de hatiye dabeşkirin (a) me'na berdeyamîyê ya dema borî û (b) me'na teqesbûn û nîşandanê ya dema niha. Gruba (2)yem di bin sê beşan de hatiye dabeşkirin (a) hevokên lêkerî yên dema niha, (b) hevokên lêkerî yên dema borî, (c) hevokên lêkerî yên perfektîf. Beşa (a)yê li ser me'na berdeyamîyê ya dema niha, erênîtî û neyînîtî, û li ser fonksiyona anaforîk ya îzafeya berfirehbûyî disekine. Beşa (b)yê wan pirsan dihewîne ku me'na prospektîf ya dema borî di çarçoveya zayend û kesan ve derdixwe holê. Beşa (c)yê jî li ser me'na prospektîfê disekine. Perça dawî de jî li ser hin taybetiyên di devoka Behdînan de heyî lê di devokên din din de tune yî tê sekinîn. Li ser me'na derbasdarî û nederbasdarî ya di hevokên navdêrî de hatiye sekinîn. Wek dawî pirsên bi mena perfektîf ya dema niha ve eleqedar hatine pirsîn.

Di Devokên Kurmancî yên Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojava de Îzafeya Berfirehbûyî

Di vê beşê de wê li ser îzafeya berfirehbûyî ya du devokên kurmancî; devokên başûrê rojhilat û başûrê rojava bê sekinîn. Ji bo devoka başûrê rojhilat gundê Çeman ya bajaroka bajarê Şirnexê Betuşşebab hate hilbijartin û ji bo devoka başûrê rojava jî Merkeza bajarê Semsûrê hate hilbijartin. Amûra pîvandîne ya îzafeya berfirehbûyî hate tetbîqkirin bo van her du devokan.

⁴³ Ev amûra pîvandîne ji hêla nivîskarê ve gotarê ve hatiye pêşxistin. Di pêveka 1 de ev amûra pîvandîyê bi mînakên xwe ve hatine dayîn.

Di Devoka Kurmancî ya Başûrê Rojhilat de Îzafeya Berfirehbûyî
 Amûra pîvandîne ya îzafeya berfirehbûyî ji bo vê devokê hate tetbîqkirin. Ji şeş kesan pirsên vê amûra pîvanê bi tirkî hatine pirsîn. Ev şeş kes li gor zayend, emir hatine dabeşkirin. Du zayend; mêr jin û sê grubê emrê; ciwan, navsere û kal ji bo grubê hate hilbijartin. Di encamê de; îzafeya berfirehbûyî bi vê awayî derket meydanê:

Tablo 9: Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Kurmancî ya Başûrê Rojhilat de

	Nêr	Mê
Şexsê Yekem Yekjimar	“(y)ê” / “(y)i/î” (neyînî) “ya”	
Şexsê Duyem yekjimar	“(y)ê” / “(y)i/î” (neyînî) “ya”	
Şexsê Sêyem yekjimar	“(y)ê” / “(y)i/î”	“(y)a”
Pirjimar	“êd”. (neyînî) “ned”	

Ji bilî şexsê sêyem yê yekjimar hemû şexsên yekjimar partîkela “ê”yê bikar tînin. Dîsa di ber partîkela “ê”yê partîkela “î” û “i” bikar tînin. Axêvera jin ya ciwan di bikaranîna şexsê yekem û duyem di hevokên neyînî de “ya” bi kar anîye. Di pirjimaran de jî ji bo hevokên erênî “ê(d)” ji bo yên neyînî jî “nêd” hatiye bikaranîn. Di gruba Ayê de hevokên navdêrî yên rengdêr û daçek hene. Di vê gurbê de ji bo şexsên yekem û duyem yên yekjimar hin caran “î” û “i” hatine bikaranîn. Ji bo şexsê sêyem yê yekjimar, wexta navdêr nêr bûye “ê/wê” hatiye bikaranîn û wexta navdêr mê bûye “a/ya” hatiye bikaranîn. Di pirjimaran de jî “êd” hatiye bikaranîn. Eger em hin mînakên ji axêveran bînin;

(1) (Ş.N.M.), (Ş.N.J.), (Ş.C.M.), (Ş.C.J.)⁴⁴

Hemşîre	ya	li	wêrê
Hemşîre	Îzf.Brîf.Mê	Daçek	Cnv.Nîş.TEW.Mê

(2) (Ş.K.J), (Ş.C.J)

⁴⁴ Ş: Şîmax, M: Mêr, J: Jin, C: Ciwan, N: Emrê Navîn, K: Kal

Asker	ê	li	wêrê
Esker	Îzf.Brf.Nêr	Daçek	Cnv.Nîş.TEW.Mê

(3) (Ş.K.M.), (Ş.N.M), (Ş.N.J.)

Ez	î	reş	im
1YJ.RST.	Îzf.Brf.Nêr	reş	kopula.1YJ.

(4) (Ş.C.J.)

Ez	ne	ya	reş	im
1YJ.RST.	Partîkela Neyîniyê	Îzf.Brf.Mê	reş	kopula. 1YJ.

(5) (Ş.K.J.)

Tu	yê	reş	î
2YJ.RST.	Îzf.Brf.Nêr	reş	kopula. 2YJ.

(6) (Ş.C.J.)

Tu	ne	ya	reş	î
2YJ.RST.	Partîkela Neyîniyê	Îzf.Brf.Mê	reş	kopula. 2YJ.

(7) (Ş.K.J), (Ş.N.M.)

Ev	sêv-êd	ha	êd	rizî	ne?
Cnv.Nîş. RST	sêv-Îzf.PJ.	Nîşander	Îzf.Brf.PJ.	rizî	kopula. 3PJ.

(8) Ji bilî (Ş.K.M.) Hemû axêver

Rêk	ned	delal	bûn
Rêk	Pêşgira Neyînîyê. Îzf.Br.f.PJ.	delal	Kopula.d.b.PJ.

Di mînakên (1) û (2)yan de pêvebera navdêrî bi daçekê hatiye çêkirin. Kirdeya (1)î mê yekjimar û ya (2)yan nêr yekjimar e. Ji bo kird-eya nêr “ê” û ji bo ya mê jî “a/ya” hatine bikaranîn. Tişteke din a girîng a bi bikaranîna îzafeya berfirehbûyî re eleqedar jî ew e ku, di van pêveberên cihî de kupula nehatiye bikaranîn. Mînakên (3) û (5) jî xwedîyê pêveberên navdêrî yên rengdêr in. Kirdeyên van hevokan şexsên yekem û duyem yên yekjimar in. Hemû axêver ji bo van “yê” yan jî “yî/yi” bi kar anîne. Lê di mînakên (4) û (6)an de axêvera ciwan ya jin partîkela mê ji bo şexsê yekem û duyem bikar anîye. Yanê wexta şexsê yekem û duyem tê bikaranîn hin axêverên jin lewra zayenda wan xwe mê ye, rêkkestîyê bi partîkela mê ve pêk tînin. Her çiqas axêverên din yên jin partîkela mê ji bo şexsê yekem û duyem yên yekjimar bi kar neanîbin jî, mirov dikare bibêje yan ev bikaranîn berbelav nîne an jî bikaranîna cudahiya nêr û mêr ya di şexsê sêyem yê yekjimar ber bi şexsên din yên yekjimar berbelav dibe.

Di mînaka (7)an de lewra kirde pirjimar e parîtkela îzafeya berfirehbûyî bûye “êd” û di (8)an de jî lewra kirde pirjimarê hevok jî neyînî ye partîkela îzafeya berfirehbûyî bûye “ned”. Di gruba Ayê de di raweyên dananî de jî îzafeya berfirehbûyî tê xwîyanê. Di vê devokê de tenê di raweya şertî de em rastê parîtkelê hatin. Wiha;

(Ş.K.M.)

Ev	rok-a	berûk-a	te	ya	tijî	bî,
Cnv.Nîş. RST	roj- Klîtîk.Dyr.	N.E.- Îzf.-Mê	2YJ. TEW	Îzf.Br.f. Mê	tijî	R.D.bûn:k.d.n .3YJ.
qedr-ê	te	jî	ya	gelek	bit	
N.E.- Îzf.Nêr	2YJ.TEW.	jî	Îzf.Br.f. Mê	gelek	R.D.bûn.k.d.n.3YJ.	

Di qisma ewil ya hevokê de partîkela îzafeya berfirehbûyî “ya” refereyê “berûk”ê dike û lewra “berûk” navdêreke mê ye loma jî parîkel di forma mê de hatiye bikaranîn. Di qisma duyem yê hevokê de

jî dîsa partîkela mê hatiye bikaranîn. Lê navdêra ku tê nîşandan nêr e. Bi me ji bo bi partîkela dema bê ve neyê tevlihevkerin ev tişt hatiye kirin. Di gruba Byê de di qismê ewil de li ser hevokên navdêrî yên cihî hatiye sekinîn. Di vê devokê de hem ji bo rewşên dema borî hem jî ji bo rewşên dema niha îzafeya berfirehbûyî hatiye bikaranîn. Bi vî awayî;

(1) (Ş.K.J.)

Roj-ek-î	ez	ê	nêçîr-ê	bû-m,	mi
Roj- Paş.NeDyr.- Îzf.Nêr	1YJ.RST	Îzf.Brf. Nêr	Nêçîr- TEW.Mê	Bûn:k.d.b. -1YJ.	1YJ.TEW.
ber-ê	xwe	da	yek-î	serhesp-i	têt
Ber-Îzf.Nêr	Cnv.Vgr.	Dan:k.d.b. 3YJ.	Yek- TEW.Nêr	Daçek hesp- TEW.Nêr.	Hat- in.k.d.n. 3YJ.

(2) (Ş.Y.K.), (Ş.O.K.), (Ş.O.E.), (Ş.G.K.), (Ş.G.E.)

Muxtar	kîrê	ye?	Muxtar	ê	li	gund e
Muxtar	kî rê	Kopu- la.3YJ.	Muxtar	Îzf.Brf. Nêr	Daç ek	gund kopu- la.3YJ.

Di mînaka (1)î de îzafeya berfirehbûyî bi pêveberekê wisa re hatiye bikaranîn ku di dema borî de ew bûyer xwedî berdewamîyekê ye. Di mînaka (2)yem de jî partîkela îzafeya berfirehbûyî bi pêveberekê dema niha ve û bi rewşeketeqes ve hatiye bikaranîn. Îzafeya berfirehbûyî bi lêkerên kêşandî re jî tê bikaranîn. Di vê devokê de di dema niha de û bi lêkerên perfekîfve îzafeya berfirehbûyî tê bikaranîn. Mesela;

(1)

îşte	ez	ê	te	di-bîn-im
------	----	---	----	-----------

Îşte	1YJ.	Îzf.Brîf.	2YJ.TEW.	P.R.D.-dîtin.k.d.n.-1YJ
------	------	-----------	----------	-------------------------

(2) (Ş.K.M.), (Ş.N.M.)

Ew	ê	Surîye-yê	hat-e	vê rê
3YJ.RST	Îzf.Brîf.Nêr	Surîye- TEW.Mê	Hatin:k.d.b.-3YJ	vê rê

(3) (Ş.C.J.)

Ez	a	dît-im
1YJ.RST.	Îzf.Brîf.Mê	dîtin:k.d.b.-1YJ.
Wî ez dîtim		

(4) (Ş.K.M.)

Biçûk-ên	me	ereb-ek-e	biçûk	a	kirî-ye
Biçûk- Îzf.PJ.	1PJ.TE W.	Erebe-Paş.Ndyr.- Îzf.Notr	biçûk	Îzf.Brîf. Mê	kirîn:k.d.b- 3YJ

Mînaka (1)î ji bo hevokeke lêkerî ya di dema niha de hatî kêşandin mînak e. (2) ji bo hevokeke xwedî meneya perfektîf mînakeke îzafeya berfirehbûyî ye. Lewra “ew” ji “Surîye”yê di wexteke nêz de hatine û hêj li vir in. Di (3)yan de dîsa meneyeke perfektîf heye. Kesê hatiye dîtin “ez” e û axêvera ku vê hevokê di vê formê de bikar anîye jî jin e. Loma refereyê xwe kiriye. Di (4)an de dîsa mena perfektîf heye. Tişteke din ji bo vê mînakê jî ew e ku îzafeya berfirehbûyî refereyê bireserê kirîye.

Wek encam em ji bo îzafeya berfirehbûyî ya di devoka başûrê rojhilat dikarin van bêjin;

1. Cudahîya zayendê tenê di şexsê sêyem de heye. Di şexsên din yên yekjimar de partîkela nêr hatîye bikaranîn. Ji bo pirjimaran jî partîkela “êd” hatiye bikaranîn.

2. Hin avêverên jin hin caran, cudahîya zayendî ji bo hemû şexsên yekjimar bikar anîne.
3. Partîkela îzafeyê ya pirjimar ji bo hevokên neyînî “nêd” e.
4. Partîkela îzafeya berfirehbûyî ji hêla fonolojîk ve wek partîkela îzafeyê ya di fonksiyona girêdanê de ye. Lê hin caran ji bo partîkela nêr ya îzafeya berfirehbûyî, cihê ku “(y)ê” were bikaranîn “i/î” hatiye bikaranîn.
5. Îzafeya berfirehbûyî ne tenê bi hevokên navdêrî lê bi hevokên lêkerî re jî hatiye bikaranîn. Dîsa mena perfektîyê ya hevokên lêkerî bi vê partîkelê ve hatiye dayîn.
6. Lewra partîkela îzafeya berfirehbûyî avaniyeke hessas e, ev partîkel jî hêla hemû axêveran ve wek hev nehatiye bikaranîn.

Di Devoka Kurmancî ya Başûrê Rojava de Îzafeya Berfirehbûyî

Îzafeya berfirehbûyî di qada vê xebatê ya duyem de yanê di devoka başûrê rojava de jî heye. Ji bo vê devokê bajarê Semsûrê hatiye hîlbijartin. Amûra pîvandîna jî bo vê devokê jî hate tetbîqkirin. Beriya ku behsa îzafeya berfirehbûyî were kirin divê behsa partîkela îzafeyê ya di fonksiyona girêdanê ya di vê devokê de were kirin. Lewra partîkela îzafeyê jî hêla fonolojîk û bikranîna xwe de xwedîyê hin taybetiyên cuda ne. Eger em di tabloyekê de partîkela îzafeyê bidin wê wiha be:⁴⁵

Tablo 10: Îzafe di Devoka Kurmancî ya Başûrê Rojava de

Zayend/Hejmar	Partîkela Îzafeyê di Rewşa Dîyar de	
Yên Însan / Yên Neînsan	Yên Însan	Yên Neînsan
Nêr	{-ê}	{-î}
Mê	{-ê}	{-ê}
Pirjimar	{-a(n)}	

Her wekî jî tabloyê jî tê xwîyanê, di vê devokê de navdêr ne tenê ji hêla zayenda xwe ya cînsî û hejmarê ve lê jî hêla însanbûn û ne însanbûnê ve jî hatine sinifandin. Navdêrên aîdê însanan in hessasîyeta zayendîhunda kirine û herdu zayend jî partîkela {-ê}yê distînin. Lê

⁴⁵ Ev agahî jî Teza Doktorayê ya nivîskarê vê nivîsê hatiye sitandin.

eger navdêr navdêrên neînsanan be wê demê partîkela îzafeyê ji bo navdêrên nêr {-î} û ji bo navdêrên mê jî {-ê} ye. Di pirjimaran de jî {-a(n)} tê bikaranîn. Pirî cana dengê /n/yê nayê bikaranîn. Pey agahiyên derbarê îzafeya di peywira girêdanê de hate dayîn, eger bikaranîna îzafeya berfirehbûyî di tabloyekê de were dayîn wê wiha be;

Tablo 11: Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Başûrê Rojava de

	Nêr	Mê
Şexsê Yekem Yekjimar	î	ê
Şexsê Duyem Yekjimar	î	
Şexsê Sêyem Yekjimar	î	ê
Pirjimar	ê	

Her wekî ji tabloyê jî tê fêmkirin di şexsê yekem û sêyem yê yekjimar de hessasîyeta zayendê heye û di şexsê duyem yê yekjimar û şexsên pirjimar de hessasîyeta zayendê tune ye. Zayenda mê ji bo pirjimaran jî hatiye bikaranîn û zayenda nêr jî ji bo şexsê duyem yê yekjimar hatiye bikaranîn. Îzafeya berfirehbûyî di vê devokê de hem bi hevokên navdêrî hem jî yên lêkerî ve hatiye bikaranîn. Em ê bi mînakên terîf bikin;

(1) (S⁴⁶.C.M.), (S.N.M.)

Ez	î	reş	im
1YJ.RST.	Îzf.Brîf.Nêr	rengdêr	kopula. 1YJ.

(2) Ji bilî (S.K.M) hemû axêver

Ti	y	reş	i
2YJ.RST.	Îzf.Brîf.Nêr	rengdêr	kopula. 2YJ.

(3) Hemû axêver

⁴⁶ S: Semsûr (Adiyaman)

Esker	î	li	wir	e
Esker.RST.	Îzf.Brî.Nêr	Daçek	wir	kopula. 3YJ.

(4) Hemû Axêver

Hemşîre	yê	li	wir	e
Hemşîre.RST	Îzf.Brî.Mê	Daçek	wir	kopula. 3YJ.

(5) Hemû Axêver

Ev	sêv-a	ê	xira- bûye	ye	mi?
Cnv.Nîş.R ST.	Sêv- Paş.Dyr.	Îzf.Brî. Mê	xirab	kopula. 3YJ.	Partîkela pirsê ya Tirkî

(6) (S.K.J.), (S.K.M.)

Rê	ne	yê	rind	bûn
Rê.RST.	Partîkela Neyînîyê	Îzf.Brî.PJ	reng- dêr	kopula.Dema Borî.PJ.

(7) Hemû Axêver

Em	ê	li	gun d	in	mi?
1PJ.RS T.	Îzf.Brî. PJ.	Daçe k	gun d	kopula. 1PJ.	Partîkela pirsê ya ji Tirkî hatî standin

(8) Hemû Axêver

Win	ê	gund	bûn
2PJ.RST.	Îzf.Brî.PJ.	gund	kopula. Dema Borî.PJ

(9) (S.K.J.)

Ez	ê	gewrik	im
1YJ.RST.	Îzf.Br.f.PJ.	rengdêr	kopula. 1YJ.

Mînakên jorîn mînak in ji bo hevokên navdêrî yên îzafeya berfirehbûyî. Di (1)î de kirde şexsê yekem yê yekjimar e û axêver jî mêr in loma jî partîkela îzafeya berfirehbûyî ya nêr “î” hatiye bikaranîn. Di mînaka (2)yan de jî kirde şexsê duyem yê yekjimar e û loma jî partîkela “y(î)” standîye. Di (3), (4) û (5)an de kirde şexsê sêyem yê yekjimar e. Di (3)yan de kirde nêr e loma jî partîkel “î” ye, di (4) û (5)an de jî kirde mê ye loma jî partîkela “ê” hatiye bikaranîn. Dîsa hevoka (5)an hevokeke pirsê ye û di hevokên pirsê de jî partîkela îzafeya berfirehbûyî tê bikaranîn.

Mînaka (6)an ji bo dema borî û neyînî mînak e û tê fêmkirin ku partîkela îzafeya berfirehbûyî ji bo dema borî û hevokên neyînî jî tê bikaranîn. Dîsa di mînakên (7) û (8)an de kirde şexsên pirjimar in û partîkel jî li gor wê guherîye û bûye “yê”. Mînaka (9)an jî ji bo şexsê yekem yê mê mînak e. Axêvera jin wexta şexsê yekem e, rêkkestin jî bi partîkela mê “yê”yê ve pêk hatiye. Di hevokên lêkerî de partîkela îzafeya berfirehbûyî ji bo mena berdewamîyê û mena perfektê hatiye bikaranîn. Mesela;

(1)

Îşte	Mem	î	hat
Îşte	Mem.RST.	Îzf.Br.f.Nêr	Hatin:k.d.b.3YJ.

(2) (S.K.J.)

Îşte	e	yî	te	di-wn-ime
Îşte	1YJ.RST.	Îzf.Br.f.Nêr	2YJ.TEW.	Pêş.r.r.-dîtin:k.d.n.-1YJ.

Di mînaka (1)î de îzafeya berfirehbûyî ji bo mena perfektîfê hatiye bikaranîn û mînaka (2)yan jî ji bo mena berdewamîyê mînak e. Wek dawî ji bo îzafeya berfirehbûyî ya di vê devokê de em dikarin bibêjin ku şexsê yekem û sêyem yên yekjimar ji hêla zayendê ve hessas

e. Ev cudahîya zayenda îzafeya berfirehbûyî wek îzafeya di peywira girêdanê de ye, ya ku ji bo navdêrên neînsan tê bikaranîn. Ji bilî vê îzafeya berfirehbûyî hem ji bo hevokên navdêrî hem jî ji bo yên lêkerî tê bikaranîn. Dîsa, lewra ev avanî avanîyeke hessas e, hin axêver hin caran di hin cihan de vê partîkelê bikar neanîne.

Encam

Îzafeya berfirehbûyî termeke nû ye ku li lîteratura zimannasîya kurdîya kurmançî zêde bûye. Ev term ji bo fonksiyona îzafeyê ya demî tê bikaranîn. Di gelek devokên kurdîya kurmançî de ev bikaranîn heye. Devokên ku heta niha di wan de îzafeya berfirehbûyî hatî dîtîn; devoka behdînan, ya torê, ya Mereşê ye. Di vê xebatê de bikaranîna îzafeya berfirehbûyî ya di devokeke kurmançîya serhedê (devokeke kurmançîya Qafqasyayê) bi awayeke kurt hatiye dayîn. Ji bilî van çar bikaranînan, di vê xebatê de, bikaranîna îzafeya berfirehbûyî ya devoka başûrê rojava (Semsûr) jî bi hûrgilî hatiye analîzkirin.

Ev xebat li ser du tiştan kûr bûye; terîf û analîza îzafeya berfirehbûyî û awayê bikaranîna îzafeya berfirehbûyî di du devokên Kurmançî de. Di qismê analîza îzafeya berfirehbûyî de, hate fêmkirin ku eslê îzafeya berfirehbûyî ji fonksiyona anaforîk ya îzafeyê tê. Di qismê duyem de jî herdu devokên hîlbijartî bi hurgilî hate terîfkirin. Di encamê de hate dîtîn ku di van devokên hîlbijartî de îzafeya berfirehbûyî ji aliyê xwe yê fonolojîk ve ji hev cuda ne. Dîsa cihê bikaranîna wan ji hêla gelek aliyan ve nêzê hev jî bin, di devoka başûrê rojava de bikaranîna îzafeyê bi îstîqartir e. Xebatên pey vê xebatê wê werin çêkirin, dikarin ji van aliyan ve vê xebatê pêşdetir bibin; ji hêla teorîk ve cihên bikaranîna îzafeya berfirehbûyî bi hurgilî terîf bikin û cihên bikaranîna yên ku heta niha nehatine kişfkirin bibînin; û ji hêla devokan ve jî dikarin di devokên din yên kurdîya kurmançî de pey îzafeya berfirehbûyî bikevin. Wexta vê dikin jî amûra pîvandîna ya di vê xebatê de hatî pêşxistin dikarin wek bingeh bikar bînin.

Çavkanî

Bedir Han, C. & Lescot, R. Kürtçe Gramer. İstanbul: Avesta Yayınları, 2004. <https://docplayer.biz.tr/8736989-Kurtce-grameri-kurmanci-lehcesi.html>.

Bülül. M. "Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)" 2, sy 1 (2017): 89-177.

Ghomeshi, G. "Non-Projecting Nouns and the Ezafe Construction in Persian". *Natural Language and Linguistic Theory*, 1997, 729-88.

Haig, G. "Alignment Change in Iranian Languages. A Construction Grammar Approach". *Empirical Approaches to Language Typology*; 37, 2008.

Haig, G. "Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle". *Çinde Nominalization in Asian Languages: Diachronic and Typological Perspectives*, John Benjamins., 1:363-90. Amsterdam, 2011.

Haig, G. "The Emergence of the Tense Ezafe in Bahdîni Kurdish." *Second International Conference on Iranian Linguistic*, 2007.

Haig, G. & Öpengin, E. "Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects." *The Journal of Kurdish Studies* 2, sy 2 (2014): 143-76.

Kirkan, A. "Zazakî de Zayend". *Bingöl Üniversitesi Bingöl Araştırmaları Dergisi* 6, sy 2 (2020): 141-98.

Larson. R. K. & Yamakido, H. "Zazaki 'Double Ezafe' as Double Case-marking." . . LSA. Albuquerque. Erişim 01 Mart 2019. <http://sem lab5.sbs.sunysb.edu/~rlarson/lsa06ly.pdf>.

Malmîsanij, M. *Kurmanca İle Karşılaştırmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbilgisi*. Stenbol: Vate, 2015.

Öpengin, E. *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê*. Stenbol: Avesta Yayınları, 2011.

Sahin, R. "Extended Ezafe Particles in Tor Kurdish". *Master, Uppsala Universitet*, 2018.

Samiian, V. "The Ezafe Construction: Some Implications for the Theory of X-Bar Syntax". *Çinde Persian Studies in North America*, 17-41. Maryland: Iranbooks, t.y.

Samur, A. *Kurdîya Kurmancî*. Stenbol: Nûbiha, 2012.

Samvelian, P. "A (Phrasal) Affix Analysis of the Persian Ezafe." *Journal of Linguistics* 43 (2007): 605-645.

Sedar, E. *Êdî Dereng Bû, Weşanên Lîsê*, 2015

Strunk, J. "The Structure of Kurdish Noun Phrase." Erişim 02 Şubat 2019. https://www.researchgate.net/publication/251783008_The_structure_of_the_Kurdish_noun_phrase.

Tan, S. Rêzimana Kurmancî. 3. bs. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2015.

Taş, Ç. Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî. 3. bs. Stenbol: Weşanên Dîwanê, 2013.

Todd, T. L. A Grammar of Dimilli (Also Known As Zaza). University of Michigan: Ann Arbor, 2008.

Zinar, Z. Di Çanda Kurdi de 37 Şaxên Zanistê. Stockholm: Weşanên Pêncinarê, t.y.

Pêvek 1: Amûra Pîvandinê ya Îzafeya

Gruba Ayê

Gruba Ayê di Ravekên Raghandinê de

Dema Niha, Erênî, Rengdêr	Ez î reş im.	Ben siyahım.
Dema Niha, Erênî, Rengdêr	Tu î reş î	Sen siyahsın
Dema Niha, Erênî, Daçek	Esker yê li wê derê ye.	Asker oradadır.
Dema Niha, Erênî, Daçek	Hemşîre ya li wê derê ye	Hemşîre oradadır
Dema Niha, Neyînî, Rengdêr	Ez ney reş im.	Ben siyah değilim.
Dema Niha, Neyînî, Rengdêr	Tu ney reş î,	Sen siyah değilsin.
Dema Niha, Neyînî, Daçek	Esker ne li wê derê ye	Asker orada değil.
Dema Niha, Neyînî, Daçek	Hemşîre na li wê derê ye	Hemşîre orada değil.
Dema Niha, Pirsyarî, Rengdêr	Ev sêva ya rizî ye?	Bu elma çürük mü?
Dema Niha, Pirsyarî, Rengdêr	Ev sêv ya rizî ne?	Bu elmalar çürük mü?
Dema Niha, Pirsyarî, Daçek	Esker î di wir de ye?	Asker orada mı?

Dema Niha, Pirsyarî, Daçek	Hemşîre ya di wir de ye?	Hemşire orada mi?
Dema Borî, Erênî, Rengdêr	Av a zêde bû.	Su çoktu.
Dema Borî, Erênî, Rengdêr	Kevir î reş bû	Taş siyahtı.
Dema Borî, Erênî, Daçek	Em a li gunda bûn.	Biz köydeydik.
Dema Borî, Erênî, Daçek	Ew î li gund bû	O köydeydi
Dema Borî, Neyînî, Rengdêr	Rê na xweş bûn.	Yollar güzel değildi.
Dema Borî, Neyînî, Rengdêr	Rê na xweş bû.	Yol güzel değildi
Dema Borî, Neyînî, Daçek	Çiya ney li wir bû.	Dag orada değildi.
Dema Borî, Neyînî, Daçek	Dar na li wir bû	Ağaç orada değildi.
Dema Borî, Pirsyarî, Rengdêr	Av a zehf bû?	Su çok muydu?
Dema Borî, Pirsyarî, Rengdêr	Kevir î zehf bû?	Taş çok muydu?
Dema Borî, Pirsyarî, Daçek	Em a li gunda bûn?	Biz köyde miydik?
Dema Borî, Pirsyarî, Daçek	Tu a li gund bûyî?	Sen köyde miydin?

Gruba Ayê Raweya Dananî

Ferzkirin	Tu dibê hun a ji wî welatê me bin	Bizim oralı olma- yasınız?
Şert	Îro eger bêrîk a tijî be, xatirê mirov î zehf e	Bugün eger cep doluysa, hatırın çoktur.
Nesîhat	Bila herdukê min a ji te re bin	Benim ikisi senin olsun.

Frazên Lenetê	Mera rêzkê wa şîn bin, tirî pê ve newê	Dilerim üzüm bağıları yeşerir ama üzüm ver- mez
---------------	-------------------------------------------	-------------------------------------------------------

Gruba Byê

Gruba Byê Pêveberên Cihî

Berdewamîya di dema Borî de	Rojekê ez ê rev û nêçîrê me, min mêzand va siwarekî hat	Birgün avdayım. Baktım bir atlı geliyor.
Teqes, Niha, Raweya Dananî	Mixtar li ku ye? Mirxtar ê di gund de ye	Muhtar nerede? Muhtar köyde. (şimdi)

Gruba Byê di Pêveberên Lêkerî de

Pêveberên Lêkerî yên Dema Niha

Berdewamî, Niha, Erênî	Aha ez ê te dibînim	İşte seni görüyorum
Berdewamî, Niha, Erênî	Çû sûkê, mêzand ku keçelok wê ji wê ve tê	Çarşıya gitti. Baktı kel adam oradan geliyor
Berdewamî, Niha, Neyînî	Meryem a dixwit ez ê naxom	Meryem'in yediğini ben yemiyorum
Berdewamî, Niha, Neyînî	Axir tu yê naxoy.	Fakat sen yemiyorsun.
Kirdeya Ketî	Î wa ewran da dare	(köpek) bulutlara havlıyor
Kirdeya Ketî	Î sayan dibe avê	(O) köpekleri suya götürüyor

Pêveberên Lêkerî yên Dema Borî

Dema borî (Teqes diqewime), nêr	Aha Mehmet ê hat	Aha Mehmet geldi.
Dema borî (Teqes diqewime), mê	Aha Tren a hat	Aha tren geldi.
Dema borî (Teqes diqewime), pirjimar	Aha Sînem û Ehmet yê tèn	Aha Sinem ve Ahmet geldiler.

Per Pêveberên Lêkerî yên Dema Perfekt

Bikaranîna ku paşgira şexsê ketî	Ew wê ji sûrî hatî vir	O Suriye'den buraya gelmiş
Bikaranîna bi paşgira şexsî ve	Wî yê ez dîtîme	Beni görmüş
Rêkkeftina bi Pêveberê re	Piçûkên me erebeka biçûk a kirîye	Çocuklarımız küçük bir araba almış

Îzafeya Berfirehbûyî di Devoka Behdînan de

Mena demdemî, Pêveberên navdêrî	ez ê musafir im	Ben misafirim
Mena nedemdemî, Pêveberên navdêrî	Tu bisilman î	Tu müslümansın
Perfekt	Ez yê hatîm	Ben gelmişim

Kurteyên di Metnê de

1: Şexsê Yekem	Dyr: Dîyar	k.d.n.: Koka Dema Niha
2: Şexsê Duyem	GEN: Rewşa Cenetîf	N.E.: Navdêra Esîlî
3: Şexsê Sêyem	Gîh:Gînanek	NeDyr: Nedîyar
AKZ: Rawşa Akuzatîf	Îzf.: Partîkela Îzafeyê	NOM: Rewşa Nomînatîf
Anf: Anaforîk	Îzf.Brîf: Îzafeya Berfire-hbûyî	Nvd: Navdêr
Cîv.Veg: Cînavka Veg-erok	k.d.b.: Koka Dema Borî	Paş: Paşgir
Pêş: Pêşgir	PJ.: Pirjimar	RST.: Rewşa Rasterast
TEW.: Rewşa Tewandî	YJ.: Yekjimar	r.r.: Raweya Ragihandinê
r.d.: Raweya Dananî		